



## **Pirs û bersiv di derbarê vaksînekirinê de**

### **Çima divê ez vaksîna vîrûs korona a SARS-CoV-2 bistînim?**

COVID-19 nexweşiyek giran e ku dikare bibe sedema nexweşiyek giran û heta mirinê jî. Hin nexweş heta demek dirêj piştî tûşbûnê jî nîşanên wekî westîn, kurtbûna nefesê, an jî windabûna bîhê û tamê (COVID a domdar) ê tecrûbe dikin. Kesên ku tûşî COVID-19 dibin, dikarin heval, hevkar û malbata xwe nexweş bikin - bêyî ku pê bizanibin. Parastina herî baş a li dijî nexweşiya COVID vaksîne ye. Kesên ku vaksîne dibin xwe diparêzin û di şerê giştî yê dijî vîrûsa korona de dibin alîkar.

### **Gelo gengaze di havînê de hemî hemwelatîyên Elman vaksîne bibin?**

Erê. Ji Hezîranê, her kes ku bixweze dikare ji bo vaksînekirinê nobetek saz bike, bêyî ku temen, nexweşiya berê û pîşe were berçav girtin. Li gorî agahdariyên heyî, li Elmanya her kes dikare di havînê de were vaksîne kirin.

### **Gelo ez mecbûr im ku vaksîne bibim?**

Na. Vaksîne kirin dilxwazi ye. Lêbelê, vaksînekirin riya herî baş e ku mirov ji dijî vîrûsa korona biparêze. Wekî din, vaksînekirin şerê giştî yê li dijî vîrusê re gelek dibe alîkar.

### **Vaksînên COVID-19 çiqas ewledar in?**

Hemî vaksînên erêbûyî ji aliyê Ajansa Dermanên Ewropî (EMA) li Ewrûpa ewledar û bibandor in. Berê erêkirinê, lêkolînên berfireh li ser tehemûlbarî, ewlehî û bandora vaksînan hatine kirin.

### **Çi bandorên neyênî gengaze piştî vaksînekirinê derkeve?**

Wekî her vaksînekirinê din, gengaze piştî vaksînekirina COVID-19, bertekên li ser vaksînekirinê û bandorên neyênî derkevin. Ev bi gelemperî piştî vaksînekirinê demek kurt çê dibe û çend rojan didome. Êşa herî hevpar li cihê vaksînê li ser milî çê dibe. Piştî vaksînekirinê gelek kes hest bi westînê, serêşê an êşa sivik dikin.

### **Kengê ez dikarim ji bo vaksînekirina xwe wextekî saz bikim?**

Pêşxistina vaksînekirinê di 7-ê Hezîranê de xilas dibe, piştî vê ku her kes - bêyî berçav girtina temen, nexweşiya berê an pîşe yê - dikare were vaksîne kirin. Hûn dikarin bal bijîşkê giştîyê xwe yan pisporê xwe hevdîtinek pêk bînin. Wekî din, doktorê şirketê di şirketê we de dikare we vaksîna bike. Destnîşankirina wextekê ji bo vaksînekirinê bi hebûna vaksînan ve girêdayî ye.

## **Gelo ez mecbûr im ku ji bo vaksînekirin diravî bidim?**

Vaksînekirin ji bo hevweletiyên, bêyî berçavgirtina rewşa bîmeya wan, belaş e.

## **Gelo li hin deveran vaksînekirin têne pêşîne kirin?**

Erê. Wezareta Tenduristiyê ji bo hin deverên ku belavbûna nexweşiyê pir zêde ye û kes li cihên tanga û qelebalix dijîn dozên zêde yên vaksînê veqetandiye. Li van bajar û navçeyan, "vaksînekirina bajarî" pêk tê. Ji kerema xwe pêvajoya rastîn bi rayedarên herêmî re lêkolîn bikin.

## **Gelo jinên ducanî dikarin vaksîne bibin?**

Jinên ducanî dikarin bi doktorê xweya jinan û zayinê re bişêwirin da ku hîn bibin ka gelo divê ew bêne vaksîne kirin yan na.

## **Gelo vaksînekirin dibe sedema bêber bûna jinan?**

Berî ku vaksîn bêne erêkirin, ew bi berfirehî hatine ceribandin. Tu şahidiyek tune ku nîşan bide ku gengaze jin ji ber vaksînekirinê bêber bibe.

Li medyayên civakî tê gotin ku vaksînekirina dijî vîrûsa korona dikare jinan bêber bike ji ber ku proteînên spîna x a vîrûsa korona û proteîna syncytin-1, ku berpirsiyar e li ser çêkirina cotê, dişibin hev. Ji ber vê yekê wekî encamek, eger laşê kesek vaksînekirî piştî vaksînekirinê li dijî proteîna spîndarê vîrûsa korona antîbodiyan hilberîne, ew tê proteîna syncytin-1 jî bigirin hedef û bi vî rengî di çêbûna cotê asteng dike. Lêbelê, ji ber ku wekhevîyên di navbera wan her du proteînan de pir hindik in, dikarin berteka têkiliya vaksîna COVID-19 bête red kirin.

## **Gelo vaksîna korona dikare bibe sedema nexweşiyên wekî penceşêrê?**

Na, şahidiyek tune.

## **Gelo rast e ku di van vaksînan de mîkroşîp hene?**

Ev xeyal çîrokên destçêkirî yê komployê ne, û ne rast in. Ev îdîa ne rast e. Zanyar serbixwe li ser vaksînên COVID-19 lêkolîn dikin. Armanca wan ev e ku li dijî COVID-19 vaksînek parastinê ya guncan hilberînin.

## **Kîjan nexweşiyên min yê berê nahêlin ez werim vaksîne kirin?**

Heta îro, ji bilî pêşniyaran/sînorkirinên heyî ji bo vaksînkên din, tu sînorek taybet ya naskirî ya din ku ji ber nexweşiyên berê be, tune.

Wekî her vaksînekirinê din, nabe ku hûn bi giranî nexweşî nebin, ji bo nimûne, nabe tay we li jor 38.5° C be. Eger we ji pêkhatiyên vaksînê re alerjîk hebe, ger hewce be divê vaksînek cûda were bikar anîn. Ev mijara behsa perwerdehiya pêş vaksînekirinê ye.

## **Li Elmanyayê jî bûyerên bazdana korona yê hatine dîtin. Gelo vaksîn dikare li hember patogjenê bazdayî jî biparêze?**

Bandora li hember bazdanê û ji ber vê yekê parastin her gav tê lêkolîn kirin. Heta niha, tu şahidyek tune ku nîşan bide ku vaksînên erêkirî gengaze nekare li hember demên giran ên bazdanên nû biparêz e.

### **Dê vîrûsa korona ya SARS-CoV-2 kengî têk biçe?**

Vîrûsa korona dê heta kengî li ser jiyana me bandorê bêxe. Eger rêjeya kesên ku têne vaksîne kirin zêde bibe, mîna her nexweşiyek din a virusî ku em jê re vaksîna dibin, em ê bi ihtîmalek mezin bikaribin bi vê vîrusê re jî bijîn.

### **Eger temenê min di bin 60 saliyê de be, ezê bikarim vaksîna AstraZeneca ya COVID-19 bistînim?**

Vaksîna AstraZeneca ji bo kesên di bin temenê 60 saliyê de ne, piştî ku agahdariyên bijîşkî hatin kontrol kirin û qebûlkirina rîskê ji aliyê kesê ku têne vaksîne kirin, dikare were bikar anîn.

### **Eger temenê min di bin 60 saliyê de be, ezê bikarim vaksîna Johnson&Johnson ya COVID-19 bistînim?**

Vaksîna Johnson&Johnson ji bo kesên di bin temenê 60 saliyê de ne, piştî ku agahdariyên bijîşkî hatin kontrol kirin û qebûlkirina rîskê ji aliyê kesê ku têne vaksîne kirin, dikare were bikar anîn.

**Agadar bimînin - saxlem bimînin!**

**Agahdariyên bêtir: [www.impfen.nrw](http://www.impfen.nrw)**